


# Êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê

*Êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di nava  
du hefteyan de 6 mehê heya 23 mehê Tebaxê 2021  
qewimîn*



KONGRA STAR  
مؤتمر ستار



## Pêşgotin:

Di rojên dawî de, dewleta Tirk êrişên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijiwartir kir. Di wan êrişan de gund, dibistan, xelkên sivîl, jin, zarok û endamên hezên parastina rewa hedef girt. Bi salane dewleta Tirk hamle û êrişên bi armanca dagirkeriyê li herema Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêkftine, her wiha rêze êrişên li ser Shengal û mala gelê Êzîdî pêk anî. Dewleta Tirk dixwaze projeya Rêveberiya Xweser û destkeftiyên şoreşa jin tunê bike. Ev êriş heman demê berfireh kirina axa Tirkîyê û siyasetên wê yê qirkirinê li hemberî gelên heremê hedef digirin. Binpêkirin û sûçên wê ji dema dagirkirina Jerablus, Al-Bab, Azaz û Afrin, heya Serêkaniyê (Ras al-Ain) û Girê Spî (Tal Abyad) berdewam dike. Nêzî salvegera êrişên meha Cotmehê li ser Serêkaniyê û Girê Spî dewleta Tirk careke din êrişên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kir.

Herçiqasî Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bo rêzgirtina agirbesta li heremê sozdabe, lê dewleta Tirk ev hevpeyman binpêkir. Berovajî wê êrişê xwe li ser heremê bi giştî zêdekir û taybet herema rojhilatê Fîratê hedef girt. Di vê dosyayê de, emê bi kurtasî êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di nava du hefteyan de qewimîn bidin.

## Êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê:

Til Temir bajarekî piçûk nêzî herema dagirkerî ya Tirk li Serê Kaniyê û Girê Spî û bakurê wî Zirgan û gundên derdora wî di dema dawî de bê navber bi dijiwarî hatin bombebaran kirin ji aliyê eskerên Tirkî û hezên Çete yê girêdayî wê. Di encamê van êrişan de jî 15 kesan zêdetir birîndar bûn û piraniya gelê heremê mecbûr man ku derkevin û koçber bibin. Hat ragahandin ku di 15 Tebaxê de dibistan li Til El-Werd 10 caran zêdetir hate hedef girtin.<sup>1</sup> Topbaran li ser gundên derdora Til Temir bê navber berdewam kir. Raghandinê diyar kir ku tenê di nav rojekê de 50 top li gundê Derdarê ketin û Gundê asûriyan ya Til Şinan û Gundên Rebîhat, Bab, El-Xêr û Şor hat bombebaran kirin.<sup>2</sup> Di encamê de jina bi navê Fehîme Elo (50) salî, zîlamê bi navê Dawûd Derwîş (60) salî, keça wî Narîman Derwîş (30) salî, zaroka 1,5 salî bi navê Gulîstan Mehmûd Elo û Ebdullah Yusif (8 mehî) birîndar bûn û anîn nexweşxana Heseke. di 17ê mehêde Jinek û Zarokekî jiyana xwe ji dest dan di encama topbarana li ser gundên Zirgan de û 10 kes jî birîndar bûn.<sup>3</sup>

Di 19 Tebaxê de Navenda tîkiliyan ya Meclisa Leşkerî ya Til Temir hat bombebaran kirin bi êrişeke belafirê bê mirov yê dewlet Tirkîyê. Di encamê de çar şervanên Meclisa Leşkerî ya Til Temirê hatin şehîd xistin, ku li gorî peyman agirbest fermî ji heremê bi cih bû. Endeama YPJ û konseya QSD Sosin Bîrhat, endamê konseya rêveber ya Meclisa Leşkerî ya Til Temirê Egîd Girkê Legê û du şervanên ji Meclisa Leşkerî ya Til Temir Rûbar Heseke û Seyfullah Ehmed di encamê êrişê de Şehîd bûn. Sosin Bîrhat, ku li Efrînê ji dayk bû, endamêkî xurt û jîr ya şoreşa Jin a Rojava bû û jixwe têvlî hamleyan rizgarkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Daesh bû. Ew bi awayekî çalakger têvlî berxwedana Şêx Maqsûd û Helebê bû, di dema ku gelê heremê di şert û mercên herî zehmet de bi mîrxazî li hemberî Dayîş berxwedidan.<sup>4</sup>

Li rojavayê Girê Spî êriş pêk hatin: di 19ê Tebaxê de gundên Sewan, Zenubiya, Erîda û Xerbet Beqer û di 20ê mehê gundê Kor Hesen li rojavayê Girê Spî hat bombebaran kirin.<sup>5</sup>

1 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/hzn-dagirker-careke-din-li-gundn-zirgan-didin-h49984.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/encamn-topbarana-li-ser-gundewarn-zirgan-h50036.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/dagirker-gund-derdara-y-til-temir-topbaran-dikin-h49973.html>

2 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/dmen-topbarana-li-gund-derdara-y-til-temir-h50030.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/dagirker-careke-din-gund-derdara-rya-til-temir-qamislo-topbaran-dikin-h50054.html>

3 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/hzn-dagirker-li-til-temir-jinek-birndar-kir-h50064.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/dr-enter-sno-du-sivln-bi-giran-birndar-bne-ji-zirgan-gihastin-heseke-h50238.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/birndarn-risa-li-ser-zirgan-gihastin-nexwesxaneyn-heseke-h50194.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/cenazeyn-pitik-jinek-deh-birndaran-ji-zirgan-gihastin-dirbsy-h50190.html>

4 [https://www.al-monitor.com/originals/2021/08/turkish-airstrike-kills-members-us-backed-kurdish-force-syria?amp&\\_\\_twitter\\_impression=true](https://www.al-monitor.com/originals/2021/08/turkish-airstrike-kills-members-us-backed-kurdish-force-syria?amp&__twitter_impression=true)

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/qsd-nasnameyn-4-sehnd-til-temir-eskere-kirin-h50326.html>

5 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/artsa-dagirker-gundewar-gir-sp-topbaran-dike-h50269.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/hzn-dagirker-rojavay-gir-sp-topbaran-kir-h50353.html>



Sivîlek bi navê Abdullah Çîmen Hemê kû di ereba xwe de bû di 21 mehê li başûr Kobanê bi êrişeke belafirê bê mirov hate hedef girtin.<sup>6</sup>

Du êrişên asmanî bi belafirên bê mirov nêzîkî bajarê Qamislo pêkhatin: di 19 mehê de li ser rîya di navbera Qamişlo û M4 erebeyek hat hedef girtin. Di encamê wê de fermanîdarê YPG Rênas Roj hat şehîd xistin, ku ji rojhilatê kurdîstanê bû. Ew beşdarî berxwedana li hemberî Dayîşê li Kobanê û hemleya rizgarkirina Menbij, Reqqa û Dêra Zorê bû.<sup>7</sup> Li pey vê di 22 mehê erabeyek li pêşiya Mala Birîndar li gundê Hîmo yê girêdayî Qamislo hate bombebaran kirin. Di vê êrişê de sê kes birîndar bûn, du ji wan endamê Reveberiya Mala Birîndaran û yek fermanîdarê QSD zîb Al-Aswad, ku li Dêra Zorê tekoşîn li hemberî şaneyên razandî yê Dayîşê da meşandin.<sup>8</sup>

Li Efrînê ku ji aliyê dewleta Tirkî hate dagirkirin û heremên din weke Şehba bênavber raştî top û êrişên hawayî yê dewleta Tirk û Çetên wê tî. Di 10 mehê Gundên Mişêrfê, Semûqa û Bendava li herema Şehba ya Efrînê hat bombebaran kirin.<sup>9</sup> Di 12 Tebaxê Tirkî û komên Çete gundê Alqemiye û Meranaz li herema Şera ya Efrînê bombebaran kirin. Di encamê de zarokê 15 salî jiyana xwe ji dest da û zarokêkî din birîndar bû.<sup>10</sup> Di rojên piştî wî bombebaranekî dijwar berdewam kir. Til Rifet jî bi diwartî hat bombebaran kirin.<sup>11</sup>

### Êrişên li ser nifûsa sivîl li Efrîn:

Hijmarekî kesan li Efrîn ten revandin û zeviyên wan tî talan kirin, îşkence û kuştin her diçe li herema dagirkirî ya Efrîn zedêtir dibe. Ev êriş hewldanek sîstematîk a paqijîya etnîkî ye. Hat ragahandin ku gorîstana şehîdan di Tîrmehê de hatiye xîrabkirin<sup>12</sup> Di hin bûyeran de Çete di bin kontrola Îstixbarata Tirk sivîl revand, di bûyeran de eşkere bû ku Îstixbarata Tirk bixwe sivîlan direvîne û paşê wan îşkence dike. di 16 mehê dîsa li Efrîn du Jin bi navê Hêvîn Oso (39) û Mizgîn Oso (45) hat revandin.<sup>13</sup> Li pey wê, di 24 Tebaxê, du sivîl ji aliyê Îstixbarata Tirkî hatin revandin.<sup>14</sup> Di nava 2 hefteyên dawî herî kem 39 kes hatin revandin.<sup>15</sup> Ji ber şer û mercên hovane li herema dagirkirî, însan koçber dibin. Wê heftê, malbateke ji 30 endam mecbûr man ku birevin heremê ne dagirkerî, ragihandin ku jiyana di nav sîstema deshilatdariya dagirkeriya Tirkî ne mûmkin e.<sup>16</sup>

### Artêşa Tirk li ser sînor sivîlan direvîne û îşkence dike:

Artêşa Tirk sivîlên ku nêzî sînor in yan hewl didin sînor derbas bikin êriş dike. Wek mînak, Ehmed Salih (16) û Mehmûd Salih Meter (17) ji Dirbêsiyê ji aliyê Artêşa Tirk hatin revandin û îşkence kirin, heya bi giranî birîndar bûn û hatin wegerandin û çûn nexweşxaneyê Hesekê.<sup>17</sup>

6 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/ez-sivl-im-dewleta-tirk-erebeya-min-hedef-girt-h50403.html>

7 <https://hawarnews.com/kr/haber/nz-15-km-dr-qamislo-li-dij-erebeyk-ris-pk-hat-h50278.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/ypg-di-risa-haway-ya-artsa-dagirker-de-fermandar-rnas-roj-sehd-b-h50331.html>

8 <https://www.hawarnews.com/en/haber/asayis-a-leader-two-administrators-of-house-of-war-wounded-injured-in-turkish-uav-bombing-h26353.html>

9 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/artsa-tirk-gundn-sehbay-topbaran-dike-h49869.html>

10 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/li-sraway-ji-ber-teqna-maynek-ciwanek-jiyana-xwe-ji-dest-da-yek-din-birndar-b-h49937.html>

11 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/dagirkeriya-tirk-til-rifet-gelek-gundn-sehbay-topbaran-dike-h50249.html>

12 <https://www.afrinpost.net/en/2021/07/turkish-authorities-bulldozers-savagely-destroy-martyrs-cemetery-in-afrin>

13 <https://www.hawarnews.com/kr/haber/dewleta-tirk-ceteyn-w-li-efrn-di-mehek-de-37-sivl-revandin-h49797.html>

<https://www.hawarnews.com/kr/haber/ceteyan-li-efrn-2-jin-revandin-h50123.html>

14 <https://hawarnews.com/kr/haber/stixbarata-dewleta-tirk-li-mabatay-2-sivl-revandin-h50494.html>

15 <https://hawarnews.com/kr/haber/li-efrna-dagirker-3-sivln-din-hatin-revandin-h50049.html>

16 <https://hawarnews.com/kr/haber/v-sib-30-kes-ji-efrna-dagirker-gihastin-sehbay-h50362.html>

17 <https://ronahi.tv/archives/106753>



Ciwanekî bi navê Ebid El-Hisên ji aliyê leşgerên Tirk hat kuştin, piştî wî hewl da sînore Tirkî li Kobanê derbas bike. 14 kesên din, gelek caran zarok ji emrê 15 heya 17 salî, birîndar bûn û hatin îşkence kirin û gelek caran hatin avêtin ser dîwarê sînore Tirkî ji aliyê leşkerên Tirk. Hate ragahandin ku keçek 11 salî û Jinek bi awayekî hovane hatin tecawiz kirin ji aliyê komekî leşgerên Tirk dema ser sînore Qamişlo hatin girtin.<sup>18</sup>

### **Statistîka bipêkirinê hêzên dagirker tenê di nava du hefteyên dawîn de:**

- 2 zarok û 1 Jin bi bombebaran hatin kuştin
- herî kêr 19 sivîl bi bombebaran birîndar bûn
- 4 caran belafirê bê mirov êriş pêkanîn
- 5 endamên hezên parastina rewa Şehîd bûn û 1 birîndar bû
- 2 endamên Rêveberiya Mala Birîndaran birîndar bûn
- nêzîkî 30 gundan û bajarên ji aliyê Tirkî û Çeteyên wê hatin bombebarankirin, di encamê de gelek kes koçber bûn
- herî kêr 39 sivîl ji aliyê Îstixbarat û Çeteyên Tirkî hatin revandin
- herî kêr 34 kes ji heremên dagirkerî ya Efrin koçberî herema Şehba bûn
- 19 kes ji aliyê sînore hatin revandin û bi awayekî hovane hatin îşkence kirin, ji wan herî kêr 7 zarok bûn
- 1 kes ji aliyê eskerên Tirk hat îskence kirin û kuştin
- 1 zarok û 1 jin ji aliyê eskerên Tirk hatin tecawiz kirin

### **Siyaseta dagirkeriya Tirk bînpêkirina hiqûqa navneteweyî ye:**

Ev êrişên ku me li jorê enîbû ser ziman bînpêkirinek berbiçav a du Peymanên Navneteweyî yê Mafên Sivîl, Siyasî, Aborî û Civakî ya 1966 -an pêk tîne, qanûna Gerdûnî ya Mafên Mirovan a 1948 -an û Peymana Parastina Mafên Mirovan û Azadiyên Bingehîn ku di 1950 -an de li Romayê hate pejirandin, (wekî Peymana Ewropî ya Parastina Mafên Mirovan te zanîn) û 12 protokolên wê. Ew bînpêkirina qanûna 1990 -an a Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya di derbarê Kesan de ye ku girêdayî hindikahiyên neteweyî, etnîkî, olî an zimanî ye, û Peymana Navneteweyî ya Mafên Siyasî yê Jinan. Di heman demê de peymana rawestandina dijminatiya leşgerî ya sê alî ya dewleta Tirk a bi Rûsya û Amerîkayê re li bakur û rojhilatê Sûriyê di 22'yê Cotmeha 2019'an de di dema êrişa dewleta Tirk a li Serêkaniyê (Ras elên) û Girê Spî (Til Abyad) bînpê dike.

18 <https://hawarnews.com/kr/haber/leskern-tirk-li-ser-snor-du-ciwan-koban-birndar-kirin-h49977.html>  
<https://hawarnews.com/kr/haber/artsa-tirk-li-ser-snor-koban-skence-li-4-ciwanan-kir-h50413.html>  
<https://hawarnews.com/kr/haber/leskern-tirk-li-nz-snor-li-zarokek-koban-da-h49686.html>  
<https://hawarnews.com/kr/haber/cendirmeyn-tirk-li-ser-snor-tecawiz-li-zarokek-jinek-kir-h49775.html>



## Encam:

Diyar e ku Tirkî gavekî paşvetir ji nîyeta dagirkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şengal û parçekî Başûr Kurdistanê ne avet. Bi êrişên Keşîfê (belafirê bê mirov) endamên hezên paraştina rewa yê Meclîsa Leşkerî û saziyên paraştina Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedef digere, ku bûne sedemê binkeftina Dayîş. Sivîl û saziyên sivîl, wek dibistan jî hedef digere, îşkence û tecawiz bikar tîne, belav kirina tirs li gelê heremê hedef digere û dixwaze berxwedan li hemberî dagirkeriyê pûçbike. Dervê wî, Tirkî di hemû heremê de êrişên hawayî pêk anî, lê bêdengiya hêzên navnetewî hişt ku hêvî bike ku ji ber encamê binpêkirina nayê sûçdar kirin. Em wek Kongra Star tu carî îşkence, tecawiz û faşîzma ku li ser me tê meşandin ji hêla dijminê mirovahiye ve, qebûl nakin û li hember van kiryanan em ê xeta berxwedan û têkoşînê bilind bikin. Ji bo wê bangewaziya me li hemû gelê me ye ku nekevin bin bandora şerê taybet û berê xwe nedin koçberiyê û welatê xwe radeştî dijmin nekin. Dem hatiye ku em bêdengiya li dora van êrişan bişkînin û hemû hêzên demokratîk zextê li Tirkiyeyê bikin ku êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestîne û li dijî faşîzma Tirk û siyaseta dagirkeriyê bisekine.



Peywendî:  
Kongra-star.org  
info@kongra-star.org  
Twitter: @starrcogress  
Facebook: KongraStarDiplomacyKongra

